

Mitte bila bibe LINKS

DIE LINKE. Berlin-Mitte bernameyeke hilibijartinê saz kiriye, ku bingeha xebata li meclîsa navçeya Mitteyê (ango meclîsa encûmenên navçeyê) ya ji bo pênc salên li pêş me pêk tîne. Em dixwazin li navçeya xwe/me:

- jiyana hevpar a pirreng û cûrbicûr ji bo tevahiya niştecihan – ciwan û pîr, kesên nû lêbicîbûyî, penaber an jî kesên ji mêj ve lêbicîbûyî – pêkan bikin.
- ji aliyê komele û koperatîfên navçeyê yê avakirina xaniyan ve bêhtir xaniyên nû û erzan werin çêkirin û di dema firotina xaniyên şexsî de mafê kirîna pêşîn a ji aliyê rêveberiya navçeyê ve were bikaranîn.
- ciyên ji bo riyên ewle yê peya û bisîklêtan bêhtir bin û her wisa tramway, bus û trêw werin dorfirehkirin û rêveberiya ciyên parka siwareyan û herêmên bi kêr trafik û bê siwara werin berfirehkirin. Em dixwazin xaçerê çêtir werin dîtin, alîkariyên bê astengî yê ji bo derbasbûna aliyê din ê rê bêhtir hebin û ciyên e-roller û e-bisîklêtan hebin.
- baxçeyên nêzîkî malên niştecihan werin parastin û bêhtir lê were nêrîn û serbanên tevahiya saziyên fermî werin hêşînkirin.
- sazkirina hêlînên nû yê zarokan û kontenjanên dibistanan bi lezûbez bibin karê sereke yê şaredariyê!
- dibistan bi lez werin nûkirin û paqijkirina dibistanan dîsa bibe karê şaredariyê.
- çalakîyên ji bo dema vala yê ji aliyê navçeyê ve yê ji bo zarok û ciwanan, dibistana hatûçûyê ya ciwanan û navenda hawirdorê ya dibistanê werin parastin û dorfirehkirin.
- navendên hevdîtinê yê navçeyê yê ji bo pîr û ciwanan û piştgirî û şêwirmendiya ji bo malbatan werin sazkirin û xurtkirin.
- xizmeta tenduristiyê çêtir û nêzîkî xaniyan be, xizmeta şêwirmendiya ji bo mirovên di zehmetiyên civakî de maqûl be û bêhtir xizmet li hemberî tenêbûnê hebin.
- beşên azad ên çandî, tesîsên sporê, klûb û kîosk werin parastin.
- projeyên entegrasyonê bi awayekî bi rêkûpêk fînanse bibin, beşdariya mirovên xwedî tecrûbeya penabertiyê pêk bînin û beşdarbûna bo bernameyên „çanda bibîranînê ya dekolonyal“ berdewam bikin.
- piştgirî bidin beşdarbûneke ji dil, biryarstandina bi hev re û beşdariyeke bi awayekî demokratîk a niştecihên vê derê.
- bêhtir xebatkar û derfeta fînanse yê rêveberiyê hebin.

Wekî din hêj bêhtir daxwazên me hene. Ev yek li ser vê derê: www.dielinke-berlin-mitte.de û li ser Facebook, Instagram û Twitter bi navê DIE LINKE. Berlin Mitte tên dîtin.